Dilsozî

Danheva : Zamdarê Zndî

Rojekê pêximberê Mesîh (Îsa), digel mirovekî bi rêde diçûn, sê nan pêre bûn. Piştî birek ji rê birîn, herdu birçî bûn. Îsa ji hevalê xwe digot :

- Niha em heryek nanekî bixwin û ya din jî, emê ji demeke din re bihêlin. Gava em birçî bûn, heryek ji me nîvî bixe.

Hevalê Îsa keyset ketê, bê wî ew nanê mayî jî xwer. Di pişt re, Îsa ji hevalê xwe pirsî: Ka wî nanî wîne. Hevalî wî gote: Berî vê bi demekê mirovekî biyan di vire derbasbû, min ew nan dayê.

Îsa ji wê gotinê vehesiya xwe nedî, lê, tu peyv nekirin. Bi hev re riya xwe girtin û çûn. Pêximber Îsa destê xwe avêt sê penç ax, bi ya Xweda, ew ax di destê wî de , bû zêr û ji hevalê xwe re got : Were em van zêran li hevekin. Ev pençek ji te re û yê din jî, ji wa kesê ew nan xweriye re û yê sisiyê jî, ji min re .

Hevêl jê re got: Min nanê dudiyê xweriye, ka wê pençê zêran bide min. Îsa jê re got: Zikekî sax û yekî çirûk, ji ber vê, hevaltiya han ji me re nabe; Divê her kes bi riya xwe de here.

Hevalê Îsa bi tenê birêket, li nîvê rê , sê çete rastî wî hatin, dest û lingên wî girêdan, zêrên wî jê birin.

Hersê çetan, bi rê de diçûn, li dervayî bajêr bi hev re digotin. Em birçîbûn, divê yek ji me xwerinê wîne. Yekî ji nav xwe dişînin bajêr. Çeteyê diçû bajêr, ramanên reş li serê wî sîwr dibin, bi xwe re dibêje: Ezê jehrê di xwerina wan kim, daku, ew bimrin, paya zêrên wan jî bibe ya min. Li pajêr, xwerina xwe dixwe û ji herdu hevalên xwe re xwerina wan tijê jehir dike.

Lê, herdu çeteyên din jî, bi hevre dibêjin. Gava ew ji bajêr vegere, emê wî bikujin û para wî ji xwe re bibin.

Hevalê wan ji bajêr xwerinê tîne, herdu li wî tên hev û wî dikujin û di piştre xwerina xwe dixwin . Piştî demeke ne dirêj, herdu çete jî dimrin

****

Dumahîk: Mirov bi çi…

Belê, pir tişt li seranserî cîhanê hatine guhatin û bi dehan bûyer qewimîne. Lê, bawerî ew e ku, tiştê tek û bi tenê nayê guhartin, raman, nêrîn û helwestên pariya Be’s e. Ew raman û nêrînên qewmecî hişk ku, ji bêtirî xwe tu kesên dî napejrînin û nabînin . Pirsgirêka serjimarê, 44 sal in berdewam e û hîn jî destlata Sûriyê bi soz û peyman ku, vê pirsgirêkê çareserbike!?. Berî çûna serok komarê Sûriyê li parêzgeha Hesekê, bêtirî carekê, berpirsiyarên dewletê sozên vegerandina nasnaman dane. Di wê çûna birêz Beşar El-Esed, bi soz û peyman, ku vegere Şamê, wê vê pirsê çareserbike!?. Piştî kongirê partiya Be’s, li ser zimanê pir berpirsiyarên Be’s û di hevpeyvînên xwe de bi qenalên telvezyonan re, digotin ku, çareserkirina pirsa kesên bênasname li ber deriya ne, an li benda imza serok e !?

. Gelo: (Ev serjimara ne li zas li gor warê teknîkî), wê çend salên dî berdewam bike.

Di dem ku, helmar di bin çapê de bû, gurzik nivîsar li kak Rizgar Kurdaxî giha me, bi navê: Kumancî...Dengê Bêkes û xebatkaran..Qêrî û lavêj.. Daritin.. gihane me